Kurmanji Roman - Zebûr Dua Dikin - WP Psalms - 2019

Zebûr 68:1 Bila Xwedê rabe, dijminê wî belav bibin, Yên ku jê nefret dikin, ji ber wî birevin!
Zebûr 5:9,10 Çimkî rastî ji devê wan dernakeve, Tije xerabî ye dilê wan, Gora vekirî ye gewriya wan, Tenê xwe xweşkirin e ya wan. 10 Ya Xwedê, wan sûcdar derîne! Bike ku planên wan hilweşin. Berî wan de, ji ber serhildanên wan ên bêhejmar, Çimkî ew li hember te bûn serhildar.
Zebûr 7:1,2 Ez xwe dispêrim te ya Xudanê min, Xelas ke min ji wanên ku ketine pey min. Azad ke! 2 Eger ku nebe xelaskarekî min, Wek şêran, Wê perçe bi perçe bikin canê min.
Zebûr 11:6 Wê li ser xeraban terafa agir û kewkurtê bibarîne, Wê para wan bikeve kasa bayê ku dişewitîne.
Zebûr 18:2 Xudan e zinarê min, kanî û rizgarkarê min. Xwedayê min, zinarê min ê xwe spartinê ye. Mertalê min, hêza min a rizgarkirinê, birca min a bilind e!
Zebûr 18:14 Tîrên xwe avêt ew ji hev belav kir, Bi avêtina birûskê ew ji hev xera kir.
Zebûr 18:17 Wî ez, ji yên ku ji min nefret dikin, Ji dijminên min ên hêzdar azad kirim. Çimkî ew ji min hêzdartir bûn.
Zebûr 18:39 Ji bo şer te ez bi hêzê rapêçandim, Yên ku li hember min rabûn di bin min de pelişandin.
Zebûr 18:45 Yên xerîb bêhêz in, Bi lerizîn ji kelehên xwe dibezin.
Zebûr 18:48 Ew min rizgar dike ji dijmin, Serhildêran dike bin serweriya min, Min diparêze ji zordaran.
Zebûr 23:3 Teze dike canê min, Bi saya navê xwe min di riyên rast de dide meşîn.
Zebûr 27:11 Ya Xudan, riya xwe hînî min bike. Li hember dijminên min, Di riya rast de bibe rêber ji bo min.
Zebûr 31:15 Jiyana min bi te ye, Xelas ke min ji destê dijminan, Û yên ku bi pey min ketine.
Zebûr 34:4 Ez li Xudan geriyam wî bersîv da min, Wî ez azad kirim, ji hemû tirsên min.
Zebûr 34:7 Dora yên ku jê ditirsin, dipêçe milyaketê Xudan, Û xelas dike wan.
Zebûr 34:13 Zimanê xwe ji xerabiyê, Lêva xwe bigire ji hîlekariyê.
Zebûr 34:17-19 Feryada rastan, dibihîze Xudan, Wan azad dike ji hemû tengahiyan. 18 Nêzikî dilşikestiyan e Xudan, Ruhê wî rizgar dike bindestan. 19 Pirr gellek in derdê rastan, Belê Xudan wan xelas dike ji hemûyan.
Zebûr 35:1-8 Ya Xudan, yên ku bela xwe di min didin tu bide bela wan. Yên ku bi min re şer dikin tu bike şerê wan! 2 Tu hilde mertalê biçûk û mertalê mezin, Rabe were alîkariya min! 3 Rahêje rim û misasa xwe, pêşî li yên ku dane pey min bibire, Ji canê min re bêje, «Ezê te xelas kim!» 4 Yên ku li kuştina min digerin, bila rezîl û riswa bibin! Yên ku li xerabiya min digerin, bila bi şermî şûn ve vegerin! 5 Bila bibin wek hurikê kayê yê li ber bayê, Milyaketê Xudan bi pey wan bikeve! 6 Bila tarî û şematok be riya wan, Milyaketê Xudan bide pey wan!

7 Çimkî, bêsedem wan di çalê de li pêş min dafik danî, Bêsedem wan, ji bo canê min çalik kolan, 8 Bila bê haypêketina wan, felaket bê serê wan, Tora ku veşartine, bibe sedemê girtina wan, Û bîne felaketa wan.
Zebûr 35:10 Bi hemû dilê xwe weha bêjim: «Ma kesî wek te heye ya Xudan, Te xelas kir bindest ji destê zordaran, Bindest û hejar ji şêlînkaran?»
Zebûr 36:7-9 Çi hêja ye kerema te, ya Xwedê! Xwe dispêrin bin siya bazkên te kurên mirovan. 8 Bi rûnê mala te têra xwe têr dibin, Ji çemên zewqa xwe tu bi wan didî vexwarin. 9 Çimkî, kaniya jiyanê ji te ye, Ronahiya te ronahiya me ye.
Zebûr 37:5 Riya xwe ji wî re bihêle xwe bispêre Xudan, Ewê bîne cih hemû pêwistiyan.
Zebûr 37:23,24 Xudan, bi mirov dide avêtin gavan, Eger ew razî be ji riya wan. 24 Bikeve jî dirêj nabe ew li erdan, Çimkî bi destê wî digire Xudan.
Zebûr 37:40 Xudan ji wan re dibe alîkar, rizgariya wan tîne, Ji destê xeraban xelas dike, azadiya wan tîne, Çimkî wan xwe li wî spartine.
Zebûr 39:1 Min got, «Ezê li riyên xwe miqate bim, Bi zimanê xwe guneh nekim; Heta li pêş min be zilamê xerab, Ezê devê xwe girêdim, nedim cewab.»
Zebûr 41:4 Min got, «Li min were rehmê ya Xudan! Şîfa bide min, çimkî min li pêş te kir gunehan!»
Zebûr 42:5 Tu çima xemgîn î ey canê min, Bo çi dinale hundirê min? Hêviya xwe bi Xwedê ve girêde, Ezê dîsa jê re spas bikim; Çimkî ew e rizgarkar û Xwedayê min. (Zebûr 43:5)
Zebûr 43:1 Li doza min binêre ey Xwedê, Min biparêze li hember bêwefayan, Azad ke, ji hîlekar û neheqan.
Zebûr 44:4 Ey Xwedê, tu yî padîşahê min, Emir bike, rizgarbûna Aqûb!
Zebûr 51:4 Li hember te, tenê min li ber te sûc kir, Min ya ku, li pêş çavê te xerab bû kir. Îcar tu, di gotinê de mafdar, Di dadbarkirinê de rastdar î.
Zebûr 52:5 Belê wê Xwedê, te her û her hilweşîne, Wê bi te bigire û te ji konê te derîne, Ji diyarê jiyanê koka te bişkivîne.
Zebûr 54:7 Te ez ji hemû tengahiyên min rizgar kir, Li pêş çavê min dijminên min helaq kir.
Zebûr 55:18 Wî ez ji şerê li hember min, Bi aştî xelas kir canê min, Çimkî zêde bûn, yên ku şer dikirin bi min.
Zebûr 59:2 Min azad bike ji sûcdaran, Min xelas ke ji xwîndaran.
Zebûr 60:12 Em bi Xwedê mêrxasiyê dikin, Ew dipelçiqîne dijminên me.
Zebûr 63:11 Belê wê padîşah bi Xwedê şa be. Yên ku bi navê wî sond dixwin, wê pesnê xwe bidin, Lê ewê devê derewkaran bê girtin.
Zebûr 66:3 Ji Xwedê re bêjin, Karên te çiqas mezin in! Ji ber hêzdarî û mezinbûna te, Wê serî li ber te deynin, dijminên te.
Zebûr 68:6 Xwedê, mala bêkesan ava dike, Dîlan dertine firehiyê, Belê serhildêr li dera ziwa rûdinên.
Zebûr 68:35 Tu çi bi heybet î, ey Xwedê, li perestgeha xwe! Xwedayê Îsrailê, ku hêz û pêkarî dide gelê xwe, Pîroz be!
Zebûr 70:1 Ey Xwedê, zû min azad ke! Ey Xudan, bi lez were alîkariya min!
Zebûr 71:4 Ey Xwedayê min, tu min xelas ke, Ji destê zilamê xerab, fesad û

xedar!

Zebûr 71:13 Yên ku dijminên min in, bila şerm bikin, biqelin, Yên li ziyana min digerin, bila bi şermî û rezaletê bên nixamtin.

Zebûr 72:12 Ew diçe hawara hejaran, Ew rizgar dike feqir û bêkesan.

Zebûr 76:12 Ew, ruhê serokan dişikîne, Ji padîşahên dinê re tirsê tîne.

Zebûr 79:9 Ey Xwedayê rizgariya me, ji bo berziya navê xwe were alîkariya me, Me rizgar ke, ji bo xatirê navê xwe, me ji gunehên me pak ke!

Zebûr 86:17 Nîşanek qenciyê bi min bide dîtin; Da ku yên ji min nefret dikin, bibînin û şerm bikin; Çimkî tu ya Xudan, tu ji min re bûyî alîkar û xemrevîn.

Zebûr 91:14,15 Ji ber ku ji min hez kir, ezê wî xelas kim, Ezê wî biparêzim, çimkî navê min nas kir. 15 Ewê bangî min bike, ezê wî bibersivînim, Di tengahiyê de li ba wî bimînim, Ezê wî azad kim, berziyê jê re bînim.

Zebûr 92:11 Çavên min, ketina dijminên min dîtin, Gohên min, şikestina dijminên min bihîstin.

Zebûr 103:10 Ew li gor sûcên me bi me re nade û nastîne, Li gor sûcdariya me heyfê ji me hilnayne.

Zebûr 104:9 Te ji bo wan, sînorekî ku derbas nebin danî, Da ku cardin erdê nenixêmin.

Zebûr 107:6 Hingê di tengahiya xwe de, ji Xudan re feryad kirin, Wî ew ji derdê wan xelas kirin.

Zebûr 118:10 Hemû miletan dor li min pêçan, Ezê wan bişikênim, bi navê Xudan.

Zebûr 118:12 Wek mêşên hingiv dor li min pêçan, Wek agirê pûş tefiyan; Ezê wan bişikênim bi navê Xudan.

Zebûr 121:7,8 Xudan te diparêze ji her xerabiyê, Ew jiyana te diparêze. 8 Ji niha, heta her û her, Xudan, çûyin û hatine te diparêze.

Zebûr 138:3 Gava min bang kir, te ez bersîvandim, Te hêz da min, te ez wêrek kirim.

Zebûr 140:1,4,5 Ya Xudan, tu min xelas ke ji zilamê xerab, Min biparêze ji zilamê zordar. 4 Ya Xudan, tu min ji destê yê xerab biparêze, Min biparêze ji zilamê zordar; Ew ku, dixwazin min averê bikin. 5 Yên qure ji bo min dafik danîn, Li qeraxê rê ben tikandin; Ji bo min kemîn danîn.

Zebûr 142:6 Goh bide hawara min, Çimkî ez pirr neçar im; Tu min, ji yên ku min dipelçiqînin azad ke, Çimkî ew xurttir in ji min.

Zebûr 143:9 Tu min ji dijminên min azad ke, ya Xudan; Ez xwe dispêrim te.

Zebûr 147:14 Ew aştiyê dide sînorên te, Bi genimê herî baş, têr dike te.

Zebûr 149:6-9 Pezindana Xwedê di devê wan de, Şûrê du devî di destê wan de, 7 Da ku ji miletan heyfê bistînin, Û gelan ceza bikin, 8 Padîşahên wan bi zincîran, Pêşewayên wan bi lelên hesin girê din! 9 Da ku, biryara nivîsandî di nav wan de rêve bibin! Ev, şerefa hemû dilsozên wî ye. Pesnê Xudan bidin!